

Namûs û bênamûsî

ROJAN HAZIM

Dem demê zanist û ragihandinê ye. Teknolojîya ragihandinê dinya kirîye gundekî çar tax. Xwecihên van taxan çawa berê di jîyana kevnare ya gundewarîyê da xelk bi bangê dîkilên hevdu hişyar dibûn, vê gavê jî bi sînyal, zeng û melodîyên telefonên destî, haj hevdu dibin, adeta sanîye sanîye hevdu taqîb dikin. Ji şivan û gavanan heta karmendên di nav ofîs û bûroyên di apartmanên şubî çiyayî serê xwe dirêjî esmanî kirî da, dest pêkve bi telefon in... Telefonên bi kamera û şandina "sms"an ser û binên dinyayê gihandine hev. Televizyon bûye platforma dîtin û seyra bûyer û qewinînen cîhanê. Ji xwe înternetê dinya adeta kirîye okyanûs ku têda her reng û tarz melevanî tete kirin. Axir ji telefona destî heta televizyon û înternetê, teknolojîya ragihandinê pêkve bûye çav û guhê mirovahîyê. Ji ber hindê, bûyerên qenc jî, xirab jî êdî bi rêya vê teknolojîya ragihandinê, li bajêr be, li gund heta mezrayekê be, dikeve nav hemû malan. Kir û kiryarên di demên berê da dihatin kirin li gundê cîran nedihatî bihîstin, belê îro bûyereke li serê Sibîryayê qewimî, di eynî demî da li gundekî Gelîyê Zê tete bihîstin û hetta dîtin bi rêya vê teknolojîya pêşkevî û modern.

Eve demek e kirêtî û rûşîyeke bêtxûb di serê rojevê da ye; kuştina jinan! Esasen di nav civatên paşvemaî û paşvehelayî da, ev sûcê giran ji berê were tete kirin û helbet binasên sosyoekonomîk, sosyopolîtîk û sosyokulturel yê vê kiryara dijmirovî hene û divêt bi berfirehî û kûrahî bêne analîz kirin. Belê di çarçoveya vê nivîsara kurt da jî be, divêt destnîşanîyek bête kirin û dengê hawara dijî vê hovîtya li ser jinê bête xurt kirin. Helbet ev sûc tinê li nav civata paşvemaî û herweha bi zanahî hatîye paşvehêlan ya Kurd da naête kirin. Lê belê, mirovê Kurd ji bûyerên nav civata xwe berpirsiyar e. Gotina "Çi bikin, di nav hemû civatên paşvemaî da dibin ev mesele" mazereteke rûşîyê ye. Rastîyek heye ku evro ev kirêtî û sûc di nav civata me da tene dîtin û kirin. Roj nîne ku li bajêr an bajêrkekî Kurdistanê nûçeyê kuştina kiçek an jineke Kurd neête bihîstin. Ev kiryarên dijmirovî ji berê were di nav civata Kurd da tene kirin, lê hem nedihatî bihîstin, hem jî bi zanahî dihatin peçinandin. Belê di şertên îro yê pêşkevî da, di nav vê deryaya teknolojîya ragihandinê da êdî eve ne mumkun e. Zihnîyeta mêrşahî, bîr û bawerîyên kevnepêrê, otorîteya dînan ya negatîv, tradîsyonên kirêt bûyne zirh, metal, şûr û tîr û kivanên desthilata mêrê Kurd. Mêrê Kurd, desthilata xwe ya salan bi rengekî dijmirovî bi kar tîne li ser jina Kurd. Mêrê Kurd, jina Kurd kirîye êxsîra xwe, xwe kirîye hakimê hemû mafan. Mêrê Kurd, "namûs" kirîye ristika desthilata xwe û kirîye stuyê jina Kurd û dîsa jin kirîye nobedara vê "namûs"ê! Mêrê Kurd her reng "bênamûsî"yê dike, belê fermana şiddet û kuştina ji ber namûsê jî li ser jinê dîsa ve ew dide. Mêrê Kurd, mefhûmê "namûs"ê bo kirêtîyên xwe kirîye zirh û metal. Mêrê Kurd, "namûs" di nav pêsîra jinê da zevt kirîye û herweha jî kirîye tabûya desthilata xwe, belê xwe ji parastina "namûs"ê jî muaf girtîye. Mêrê Kurd, ev bar û wezîfeya hinde giran, -ku bedelê îhmala vê wezîfeyê can e û biryardêrê vê yêkê ji dîsa mêr bi xwe ye-, daye ser milê jina Kurd û xwe daye alîyekê!. Mêrê Kurd, bi kiryarên xwe yê bi navê "namûs"ê beramberî jina Kurd dike, sûcdar e û bi van kir û kiryarên xwe ve jî "bênamûsî"yê dike!.

Belê mîxabin ku paradoksa jina Kurd jî kûr e ku, her ew jin, vî mêtê hov digihîne, li ser serê xwe dike hût û cinawir!.

Ne tinê kuştin, her reng şiddeta li ser jinê divêt bête mehkûm kirin. Mêtê Kurd divêt xwe ji vê kirêtîyê rizgar bike. Şiddet û kuştina li ser jina Kurd, rûreşîya mêtê Kurd e. Li ser vê yêkê Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê [KNK] bangeke gelek giring kirîye ku divêt herkes beramberî vê bêdadîya li ser jina Kurd dengê xwe bilind bike. KNKê wisa gotîye di banga xwe da; "Digel pirs û pirsgerêkên polîtîk, herweha problemên sosyal yê navînî jî jîyana xelkê Kurdistanê tengav û bi êş û jan dîkin. Di serê van problemên sosyal da jî, şiddeta li ser jinê ye. Di van rojan da kuştina jinan li Kurdistanê di serê rojevê da ye. Helbet binasên sosyoekonomîk, sosyopolîtîk û sosyokulturel rola sereke dileyizin di vî warî da. Dewleta kolonyalîst ya Tirkîyeyê ji serî were gelek bi zanahî sîstemê eşîrî û feodalîyê li nav civata Kurd jînde hêla û vê polîtîka xwe didomîne jî. Li ser van adet û tarzên jîyana kevnare, teessûbîya dînî, nexwandahî, zihnîyeta bi salan ya mêtêşahî ya di nav civata Kurd da, jîyan li jinê heram kir, kire jahr û mirin. Mêtê û adet û zihnîyeta kevnepêrê ya civata Kurd, xwe kirin yêk û desthilata xwe li ser jinê ava kirin, jin kirin depê armanca kirêtîyên xwe. Barê giran yê "namûsê" danan ser milê jinê û bi lêdan, her reng şiddet û kuştinê jin kirin êxsîrê xwe. KNK her bi çi binasî be, şiddet û kuştina jinê neku tinê şermizar dike, mehkûm dike û bangî xelkê Kurd, pêşengên polîtîk, rêber û rênîşanerên civatê, yê dînî û ronakbîran dike ku her bi çi rengî be, rêyê li ber vê weşeta li ser jinê bigirin, bi daxuyanîyên şermizar û rûreşkirinê nemînî, mûeyyîdeyekê biafirînin ku li ser vê bêperwatîya zihnîyeta mêtêşahîya mêtê Kurd lêveker be."

Divêt herkes ji milê xwe ve li ser vê pirsê raweste û reftara xwe kîvş bike. Bêdadîya li ser jinê têtê kirin, bêdadîya herî mezin e! Xwe ji vê kirêtîyê xilas bikin, destên xwe ji vî sûcî bişon, rûyê xwe spî bikin!.

Çirîya Paşîn [Teşrîn – November] 2006